

# Zagona dij bi Terorîzmê 2000

## Mafên xwe di maweya destbiserbûnê de ji bîr nekin

Mafên qeydkirî di nava vê Belavokê de li gorî qanûna Ingîlz û Wêls ji bo we hatine misoger kirin û bi [Fermana 2012/13 Yekîtiya Ewropayê](#) di warê mafê ragehandina di dozgeriyên cezayî de bicih dibe.

Mafê we di binkeya polîsî di vê rûpelê de bi kurtasî hatiye destnîşan kirin.  
Agahiyên bêtir li ser gotarên 1 heta 11 di rûpelên din de hatiye destnîşan kirin.  
hûragahiyan tam dikarin di Rêznameya H ya polîsî de bibînin.

1. Eger di maweya amadebûna di binkeya polîsî de pêwîstiya we bi polîsî hebe, mijarê ji polîsî re rabigehînin. Ev kare belaş e.
2. Eger dixwazin kesekî ji cihê xwe agadar bikin, polîsî li ser vê mijarê agahdar bikin. Ev kare belaş e.
3. Eger bixwazin dikarin zagonên polîsî, - ku bi navê Rêzname tête naskirin, ji wan bixwazin.
4. Polîs derbarê hewcedariya ji doktorî re agahdar bikin. Nexweşî an birîndariya xwe ya gengazî ji polîsî re ragehînin. Xizmetên bijîşkî belaş e.
5. Eger ji we derbarê tawanbariya tevlêbûna di pêkanîn, amadekirina an paldan çalakiyên terorê, pirs hate kirin, dibe hûn bizanibin ku bersiv dana van pirsan ne pêwîst e. Helbet, eger di dema lêpîrsînê, dev ji destnîşan kirina tiştên ku qirare di pêşerojê de wan wek şahidiyek bikar bînin, berdî, pêvajoya parastina we gengaze asteng bibe. Gotinên we gengaze wek belge bêne bikaranîn.
6. Dibe ku polîs we ji cewhera tawanbariya tevlêbûna di pêkanîn, amadekirina an paldan çalakiyên terorê û sedema destbiserbûnê û heps kirina we agahdar bike.
7. Dibe ku polîs ji we an parêzera/ê we rê bide ku dosye û belgeyên têkildarî destbiserbûnê û heps kirina û maweya mayîna we di bikeya polîsî de bibînin.
8. Eger we pêwîstî bi wergêr hebe, dibe ku polîs ji we re wergêrekî pêşkêş bike. Hûn dikarin belgeyên pêwîst daxwaz bikin. Ev kare belaş e.
9. Eger hûn ne xelkê Birîtanî ne û dixwazin gel balyozxaneya an konsulxaneya xwe pêwendiyê bigirin, yan jî wan liser girtina xwe agadar bikin, ev mijarê ji polîsî re ragehînin. Ev kare belaş e.
10. Dibe ku polîs ji we bêje ka hûnê çiqas di girtîgehê de bimînin.
11. Eger hûn tawanbar bin û dosyeya we ji dadgehê re bête şandin, hûn an parêzera/ê we dikare belgeyên têkildar berî civîna dadgehê bibîne.

Pirsên xwe li ser ev mafane dikarin ji efserê destbiserkerê polîsî yê girtîgehê bipirsin



Home Office



Legal Aid  
Agency



The Law Society

Ji bo agahdariya bêtir li ser pêwîstiyên polîsî di warê tevgera bi we û lînêrîna we, serdana rûpelên paş beşa kurtasiyê bikin.

**Ev guhertoya ji Belavoka Mafan û Berpirsiyan ji 1 ê Desembera 2018 an ve, nirxdar tê hesibandin**

Vê agahdariyê ragirin û bilez bixwînin. Bi alîkariya wan dikarin biryarên baştir di maweya beşdar bûna di binkeya polîsî de bigirin.

## 1. Bikaranîna parêzerî

- Parêzer dikare derbarê babetên qanûnî de, şêwirê pêşkêşî we bike.
- Daxwaz kirina parêzerî nayê wê wateyê ku hûn tûşî tawanê bûne.
- Dibe Efserê Destbiserkerê Polîsî ji we bipirse ka pêwîstiya we bi şêwira hiqûqî heye yan na. Ev kare belaş e.
- Dibe polîs rê bide we ku di herdemê ji amadebûna we di binkeya polîsî de, roja an şevê, bi parêzerê xwe re têkilî bikin.
- Eger hûn şêwira hiqûqî daxwaz dikin, polîs bi piranî destûr tune ye ku beriya hevdîtina bi parêzerî, lêpîrsînê ji we bike. Dikarin daxwaz bikin ku parêzer di odeya lêpîrsîna polîsî de amade bibe.
- Eger hûn ji polîsî re bêjin ku şêwira hiqûqî ne hewce ye, lê paşê biryar xwe biguherin, dibe hûn ji Efserê Destbiserkerê Polîsî daxwaz bikin ku têkiliya we bi parêzerî re pêk bîne.
- Eger parêzger serdana binkeya polîsî neke an jî we re têkilî neke, yan jî axavtina bi parêzerî dubare pêwîst be, dibe ku hûn ji polîsî re bixwazin ku dîsa bi parêzerî re têkilî bike.
- Hûn dikarin daxwaz bikin ku bi parêzerekî nasyarê xwe re biaxivin. Dayîna pere ji bo şêwira hiqûqî ne pêdivî ye. Eger we parêzerek nasyar tune ye, yan ev parêzer neberdest e, hûn dikarin bi Parêzera/ê Berpirsyar re biaxivin. Ev kare belaş e.
- Parêzera/ê Berpirsyar ti têkildariyek bi polîsî re tune ye.

### Ji bo pêşkêş kirina şêwira hiqûqî ya belaş:

- Polîs bi Navenda Têkiliya Parêzerî ( DSCC ) re têkilî dike. DSCC piştrast dike ku hûn ji parêzera/ê bijartî yan ji Parêzera/ê Berpirsyar, şêwira hiqûqî werdigirin.
- DSCC xizmetek serbixwe ye ku berpirsiyariya dabîn kirina şêwira hiqûqî ya belaş li ser milê vê ye û bi polîs re ti têkilî nîne.

### Eger hûn dixwazin ku bi xwe xercê şêwira hiqûqî bidin:

- Hûn hertim dikarin, eger hez bikin, bi xwe xercê şêwira hiqûqî pêşkêş bikin.
- DSCC ji aliyê we tê bi parêzera/ê we re têkilî bike.
- Hûn dikarin bi kesane yan telefonî bi parêzera/ê xwe yê bijartî re biaxivin an jî parêzer gengaze bixwaz ku di girtîgehê de b we re hevdîtin bike.
- Eger parêzera/ê bijartî neberdest be, polîs hê jî dikare bi DSCC re têkilî bike û piştrast bike ku ji Parêzera/ê Berpirsyar şêwira hiqûqî ya belaş bistînin.

## 2. Ragehandina amadebûna di girtîgeha polîsî ji kesên din re

- Hûn dikarin ji polîsî daxwaz bikin ku bi kesên ku dibe ji amadebûna we di binkeya polîsî de agadar bibin, têkiliyê bike. Ev kare belaş e.

- Ew di şûn de tê bi kesê hilbijartinê re têkilî bikin.

### 3. Dîtina Rêzname yê

- Rêzname set of qaîdeyên ku ji mana xwe di bin çavan de jî li polîsan çî ew dikarin çî bikin û dibe çî ne. Di nava Rêzname yê de hûragahiyên mafên kurtasî di vê Belavokê de, heye.
- Polîs tê derfeta xwendina Rêzname pêşkêş we bike, lê eger ku pêşî li lêpîrsîna polîsî liser tawanbarîya we bigre hûn nikarin ev karî bikin.
- Eger hûn bixwazin Rêzname yê bixwînin, dibe ku bi Efserê Destbiserkerê Polîsî re têkilî bikin.

### 4. Bikaranîna xizmetên bijîşkî di rewşa nexweşî an birîndarî yê de

- Polîs li ser nexweşî, birîndarî, an hewcedariya ji dermankirinê re agahdar bikin. Ew dikarin bi bijîşk, hemşîre, yan pîsporên din ê xizmetên tendurustiyê têkiliyê bikin û ev belaş e.
- Gengaze ku izina bikaranîna dermanî ji we re were dayîn, lê di pêşîyê de polîs dibe kontrol bike. Bi piranî destpêkê hemşîreyek we dinere, lê eger pêwîst bike, polîs doktorek ji bo tedawiya we bang dike. Hûn dikarin doktorek din, lê li ser hesaba xwe, bixwazin.

### 5. Mafê Bêdeng mayinê

Eger ji we derbarê tawanbariya tevlêbûna di pêkanîn, amadekirina an paldan çalakiyên terorê, pîrs hate kirin, dibe hûn bizanibin ku bersiv dana van pîrsan ne pêwîst e.

Helbet, eger di dema lêpîrsînê, dev ji destnîşan kirina tiştên ku qirare di pêşerojê de wan wek şahidiyek bikar bînin, berdî, pêvajoya parastina we gengaze asteng bibe.

Gotinên we gengaze wek belge bîne bikaranîn.

### 6. Agahdarî ji sedema girtin û destbiserkirinê

- Dibe ku polîs hinek agahiyên pêşkêşî we bike daku hûn bikarin ji sedema girtina û tawanbariya tevlêbûna di pêkanîn, amadekirina an paldan çalakiyên terorê, agahdar bibin.
- Li binkeya polîsî de, dibe ku rayedar ji we re bêjin ka çima destbiserkirina we li gorî wan, hewce ye.
- Berî lêpîrsîna we derbarê tawanbariya tevlêbûna di çalakiyên terorê, polîs dibe Agahiyên kêrhatî li ser tawanên we ji we bixwe yan parêzera/ê we pêşkêş bike, da ku bikarin bêyî asteng kirina pêvajoya lêkolîna polîsî, ji xwe biparêzin.
- Ev esase derbarê her tawana ku polîs we tawanbar nas dike, rast e.

## 7. Dîtina dosye û belgeyên peywendîdarî girtin û destbiseriyê

- Di dema destbiserkirina di binkeya polîsî de, karbidestên polîsî dibe:
  - ~ Sedem û pêwîst bûna girtinê û pêwîst bûna girtina we ji aliyê polîsî di dosyeya girtina we de qeyd bike.
  - ~ Derfeta xwendina dosyeyê ji we û parêzera/ê we re pêşkêş bikin. Efserê Destbiserkerê Polîsî tê ev karî cîbecî bike.
- Polîs dibe piştrast bike ku hûn an jî parêzera/ê we, bikarin belgeyên pêwîst ji bo dijberî kirina bi qanûnîbûna girtin û destbiserkirina xwe bidest bînin.

## 8. Bikaranîn wergêr û belgeyên taybetî ji bo alîkarî kirina we

- Eger hûn Inglîzî fêhm nakin yan bi ev zimanî napeyvin, polîs tê bi destê kesekî ku zimanê we dizane, alîkarî we bike. Ev kare belaş e.
- Eger hûn kerr in an tûşî astengiyê di axaftina xwe de nepolîs dê piştrast bike ku wergêrek bi Zimanê Îşaretan Inglîzî alîkarîya we bike. Ev kare belaş e.
- Eger hûn Inglîzî fêhm nakin yan bi ev zimanî napeyvin, polîsî tê bi alîkariya wergêrekî ji we re bêje, ka çima hûn hatine girtin. Ev kare dibe hercar ku biryarek ji bo ragirtina we di girtîgehê de derdiçe, pêk were.
- Piştî hercar ku biryarek ji bo ragirtina we di girtîgehê de derdiçe, û paş tawanbarbûna we ji pêkanîna tawanê, polîs dibe dosyeya we ku di nav de sedema girtin û tawanên we hatine nivîsîn, bi zimanek ku hûn fêhm bikin, pêşkêş bike, xênjî ku sedemên taybetî ji bo redkirina ev karî hebe. Ev pêk tên ji:
  - ~ Eger hûn bizanin ji ber sedema fêhm kirina bûyeran bi temamî û encamên nebûna vê dosyê, we di pêvajoya parastina xwe de pêwîstî bi vê tune ye û derfet bikaranîna parêzerî jo bo şewirê û biryar girtinê ji we re hatiye dayîn. Di vê rewşê de, dibe hûn bi nivîskî razîbûna xwe ragehînin.
  - ~ Eger wergêra devkî yan amade kirina kurtasiyê bi alîkariya wergerê hevdem di şûna wergera nivîskî ji bo parastina xwe kêhatî be û hûn bi tevahî bûyerên fêhm bikin. Ev karî pêdivî bi destûra efserê destbiserkerî heye.
- Eger polîs we lêpîrsîn bike û civîna lêpîrsînê qeyd neke, wergêr tê pîrs û bersiva bi zimanê we, belge bike. Berî ku hûn vê belgeyê weke belgeyek rastîn îmze bikin, derfeta xwandina vê tê ji we re were dayîn.
- Eger hun bixwazin daxuyaniyekî radest polîsan bikin, wergêr tê kopiyek ji vê daxuyaniyê bi zimanê we amade bike da ku hûn piştî xwendinê, vê îmze û erê bikin.
- Mafê we heye ku guhertoya wergerandî ya vê Belavokê bidest bînin. Eger guhertoya wergerandî berdest nebe, dibe agahî bi rêya wergêrê devkî ji

were bêne dayîn, û paşê guhertoya wergerandî bêyî derengî ji we re were dayîn.

## 9. Têkiliya bi balyozxane an konsulxane yê

Eger hûn ne xelkê Birîtanî ne, dikarin ji polîsî re ragehînin ku hûn dixwazin gel Komisyona Bilind, balyozxaneyê an konsulxaneyê xwe pêwendiyê bigirin û wan liser cih û sedema girtina xwe agadar bikin. Ew dikarin bi keasne serdana we bikin yan piştrast biken ku parêzerek serdana we bike.

## 10. Hûnê heta çi maweyekê destbiserkirî bimînin

- Eger tawanek li ser we nehatibe sepandin, tenê di rewşekî de gengaze ku zêdetir ji 48 saetan bêne destbiser kirin ku dadgeh destûra domandina girtina we ji polîsî re pêşkêş kiribe. Dadgehê ev desthelate heye ku maweya destbiser kirina bêyî sûcdariyê herî zêde 14 rojan ji dema destbiserkirinê, bidomîne.
- Carna ofîserek bilind ê polîsî dibe dosyeya we kontrol bikin da ku bibînin ku hewce dike hûn hê jî destbiser bimînin an na. Ji ev karî re venêrîn dibêjin. Xênjî ku eger rewşa we nebaş be, we mafê ragehandina nêrîna xwe li ser vê biryarê heye. Parêzerê we ev maf heye ku li ser vê biryarê bi şûna we biryar bide.
- Eger berpirsê venêrînê we serbest bernede, dibe ku sedema vê ji we re were ragihandin û di dosyeya destbiserkirina we de qeyd bibe.
- Eger destbiserkirina we êdî nehewce be, dibe ku hûn serbest bêne berdan.
- Dema ku polîs domandina dema destbiserkirinê ji dadgehê daxwaz dike:
  - ~ Dibe we bi derçûna daxuyaniya nivîskî ji dema civîna dadgehê û babetên daxwaza domandina dema destbiserkirinê agadar bike.
  - ~ Dibe hûn ji bo beşdarbûna di civîna dadgehê ji dadgehê re bêne birin xênjî ku pêwendiyek televîzyonî ava bibe da ku bikarin deng û wêneya merivan li dadgehê de bibînin û ev bikaribin we bibînin û dengê we bibihîzin.
  - ~ Mafê we heye ku bi parêzerekî di dadgehê de amade bibin.
  - ~ Polîs tenê dikare demekê we di girtîgehê de ragire ku dadgehê pêwîst bizane û polîs bi lezgîniyê û şarezayî dosyeya we lêkolîn bike.
- Eger polîsî delîlên kêrhatî ji bo şandina we ji dadgehê re hebin, di binkeya polîsî an bi rêya poste ji we re tê ragehandin ku ji bo pêvajoya dadgehê amade bibin.

### Venêrîn û domandina maweya destbiserkirinê

- Carina gengaze maweya destbiserkirinê paş destbiserkirinê zêdetir ji 48 saetan dirêjtir bibe. Di vê rewşê de, dibe agahiyên li jêr, ji we re bêne pêşkêşkirin:
  - ~ Belgeya nivîskî li ser daxwaza domandina maweya destbiserkirinê;
  - ~ Dema pêşkêş kirina daxwazê;

~ Dema lêkolîna daxwazê li dadgehê

~ Sedem (sedemên) daxwaza domandina maweya destbiserkirinê.

Hercar ku daxwaza domandina maweya destbiserkirinê pêşkêş dibe, dibe ku daxuyaniyek ji we (yan nûnera xwe ya qanûnî) were radestirin.

## **11. Bidestanîna belgeyan gava ku dosye diçe dadgehê**

- Eger hûn li ser tawanekî hatine tawanbar kirin, hûn an parêzera/ê we, dibe delîlên li dijî we û belgeyên pêwîst ji bo parastinê, bînin. Ev kare dibe beriya destpêkirina pêvajoya dozgeriyê destpê bike. Polîs û Servîsa Pêçûna Padişehî, berpirsyarin ku ev karî rêkûpêk bikin û derfeta bidest anîna belge û babetên pêwendîdar ji were dabîn bikin.

# **Xalên din ku dibe liser mayîna di binkeya polîsî de bizanin**

## **Kalîteya tevgera bi we û ragirtina we**

Ev xalene ji we re dibêjin ku dibe di binkeya polîsî de li benda çî bisekinin. Ji bo agahiyên zêdetir, serdana Rêzname yê bikin. Di nava vêbelgeyê de lîsteyek heye ku gehîştina we ji agahiyên zêdetir li ser van xalan re hêsantir dike. Pirsên xwe ji Efserê Destbiserkerê Polîsî bipirsin.

## **Kesên hewcedarî alîkariyê**

- Eger hûn bin temenê 18 salan de an ziyangir bi, ji bo nimûne, tûşî pirsgrêkên hînbûnê an hişmendiyê bibin, tê maf we hebe ku carna di binkeya polîsî de kesekî bi xwe re binin. Ev kese mezinsalê jêhatiyê we tê binav kirin û guhartoyek ji vê Belavokê werdigire
- Mezinsalê jêhatiyê we alîkarîya we dike daku bûyeran fêhm bikin û berjewendiyên we diparêze. Ev kesedibe dema ku polîs we ji maf û sedema destbiserkirina we di binkeya polîsî de agadara dike, ligel we be. Herwisa dema ku polîs hişyariya xwe ji were dixwîne, dibe kugel we be.
- Mezinsalê jêhatiyê dikare liser navê we daxwaza parêzerekî bike.
- Eger hûn bixwazin, hûn dikarin daxwaz ji mezinsalê jêhatiyê xwe bikin ku di maweya axavtina we bi parêzerî re, li derveyî odayê bimîne.
- Polîs dikare di dema destbiserbûna we di binkeya polîsî de yek ji çalakiyên jêrîn bike. Ji bilî Sedema taybetî, mezinsalê jêhatiyê we dibe di tevahiya maweya ku polîs van tiştan dike, li gel we be:
  - ~ Lêpîrsîna ji we an ji we daxwaz kirin ji bo imze kirina daxuyaniya nivîskî yan nivîsên polîsî.
  - ~ Jêkirina kincên we yê bin ji bo lêgerîna fîzîkî ya leşê we.
  - ~ Rakirina şopa tiliyan, wêne, nimûneya DNA an jî nimûnên dî yê biyolojîk ji we.
  - ~ Pêkanîna her tiştek ku girêdayî pêvajoya naskirina şahidî be.
- Mezinsalê jêhatiyê we dibe derfeta alîkariya şexsî yan telefonî ji bo we, gava ku polîs dosyeya we venêrîn dike, hebe, û bibînin, ka domandina destbiseriya we pêwîst e an ne.
- Mezinsalê jêhatiyê we (eger hebe), dibe di dema ragehandina tawanê ji we re di binkeya polîsî de amade be.

## **Vergirtina hûragahiyên derbarê destbiserbûna we di binkeya polîsî de**

- Her tiştek ku di binkeya polîsî de tê serê we, dibe bête qeyd kirin. Ji koma ev belgeyane re Dosyeya Destbiseriyê dibêjin.



- Dema derketina ji bikeya polîsî, hûn an parêzer an mezinsalê jêhatiyê we dikarin rûnivîsek ji ev Dosyeya Destbiseriyê daxwaz bikin. Dibe polîs rûnivîsek ji vê Dosyeya Destbiseriyê bilez ji we re pêşkêş dikin.
- Heta 12 mehan piştî derketina ji binkeya polîsî jî dikarin rûnivîsek ji vê Dosyeya Destbiseriyê daxwaz bikin.

## **Pêwendî girtin**

- Li gel hevdişîna bi parêzerê û agadar kirina kesên din ji mijara destbiserbûnê, bi piranî izina peywendîya telefonî jî ji were tê dayîn.
- Eger tu dixwazî pêwendîya telefonî pêk bînin, hûn dikarin vê yekê ji polîsî re rabigehînin.
- Herwisa hûn dikarin pel û penûsê daxwaz bikin.
- Kesên din jî dikarin serdana we bikin, lê, desthilatdarê destbiserkirinê dikare vê izinê nede.

## **Girtîgeha we**

- Eger gengaz be, dibe hûn di nava girtîgeha kesane de bîne ragirtin.
- Ev cihe dibe paqij, germ û ronahî be.
- Nivînê we jî dibe paqij û rêkûpêk bin.
- Destûra bikaranîna destavxanê û serşokê dibe ji we re bête dayîn.

## **Cil**

Eger cilên we yê kesane ji we bistînin, polîs, dibe cilên din bidin we.

## **Xwarin û vexwarin**

Dibe ji we re 3 dana xwarin bi vexwarin bête dayîn. Di nava danê xwarinê de hûn dikarin vexwarinan bikar bînin.

## **Werziş**

Eger gengaz e, dibe hemû rojan derfeta derketina be hewayê azad ji were pêşkêş bibe.

## **Di dema lêpirsînê de**

- Ode dibe paqij, germ û ronahî be.
- Nabe hûn mecbûr bin ku bisekinin.
- Dibe karbidestên polîsî nav û meqamê xwe ji were ragehînin.

- Dibe ji we re derfeta bēnvedanê bo danê xwarinê û dema bēnvedanê ji bo vexwarinê paş nêzî 2 saet lêpîrsînê were dayîn.
- Di maweya destbiserkirinê de, pêwîste ku her 24 saetan 8 saetan ji bo bēnvedanê derfeta we hebe.

## **Pêwîstiyên olî**

- Di maweya destbiserkirinê de, hûn dikarin emrazên pêwîst ji bo pêkanîna merasîmên olî ji polîsî daxwaz bikin. Eger pêwîst be, ew dikarin pirtûkên olî û tiştên din ji bo we dabîn bikin.

## **Rewşên ku zagonên normal tên guhertin**

### **Bikaranîna parêzerî**

Carina beriya ku bi parêzera/ê xwe re hevdîtîne bikin, polîs tê bi rewşeke acîl, lêpîrsînê ji we bike. Agahiyên li ser ev rewşane di Rêzname yê de hatine pêşkeş kirin. Di Rêzname yê de hatiye diyar kirin ku di maweya destbiserbûna we di binkeya polîsî de, çi çalakî ji bo polîsî destûrdarin û çi qedexe ne. Ji bo agahiyên bêtir, serdana benda 6.7 ji Rêzname yê bikin.

Carna, polîs nahêle ku hûn bi parêzera/ê bijartî re biaxivin. Di vê rewşê de, dibe derfet bijartina parêzerek din ji we re bête dayîn. Ji bo agahiyên bêtir, serdana Pêveka B ji Beşa H ji Rêzname yê bikin.

Carna, polîs nahêle ku hûn bi şeweya kesane bi parêzera/ê xwe re biaxivin. Di rewşa wisa de, efserk paybilind yê polîs tê ji berpirsek re destûrê bide ku bi kincên fermî di odeya lêpîrsînê de beşdar bibe Ji bo agahiyên bêtir, serdana benda 6.5 ji Beşa H ji Rêzname yê bikin.

### **Ragehandina amadebûna di girtîgeha polîsî ji kesên din re**

Carna, polîs nahêle ku hûn bi kesekî re têkilî bikin. Agahiyên li ser ev rewşane di Rêzname yê de hatine pêşkeş kirin. Ji bo agahiyên bêtir, serdana Pêveka B ji Beşa H ji Rêzname yê bikin.

## **Serdarên Serbixwe yê Girtîgehê**

Hin kesên di civakê da destûr hene ku nişkave serdana binkeya polîsî bikin. Ev kesane ku serdêrên serbixwe yê girtîgehê tene binav kirin, xêrxwazane hewl didin ku ji başbûna rewşa kesên hatin destbiserkirin û berdestbûna mafên wan ji wan re, piştrast bibin.

Hûn nikarin ji bo dîtina serdêrên serbixwe yê girtîgehê daxwazê pêşkêş bikin yan ji wan bixwazin ku serdana we bikin, lê her yek ji wan dikare daxwaza dîtina we bike. Eger serdêrên serbixwe yê girtîgehê di maweya destbiserbûnê de serdana we biken, bi awayekî serbixwe ji polîsî lêkolîn dikin ka refah û mafê we hatiye parastin na. Helbet, eger hûn naxwazin ku wan bibînin, ti pêwîstiyek ji bo dîtina wan tune ye.

## **Şewaza gilî kirinê**

Eger hûn bixwazin li ser tevgera bi xwe re gilî bikin, dibe hûn bi rayedarê polîsekî re ku lêpirse yan meqamek bilindtir heye, bipeyivin. Paş serbest berdanê jî hûn dikarin bi serdana her yek ji binkeyên polîsî yan Nivsîngeha Serbixwe ya Kiryarên Polîsî (IOPC) gilîya xwe pêşkêş bikin yan piştrast bikin ku parêzer yan MP li ser navê we, gilî bike.